



К'ътеба Р'ут'

Пешготън

Сәрнатийа Р'ут' 1100 сал бәри буйина Иса qә-
шьмийә, wi чахи he п'адша сәрверти Исраеле нә
дъкърын. Эв сәрнатийа э'дълә бәрдъл, bona xwә-
йиә'съла чаша ч'ә'вканийа авейә кö бәр'ийа бе-
wада э'мър дъда мәрьвед гёнәк'ар. ²Эв сәрнати
ль сәр qизәкә Mowабийә щаһыл hатийә ньвисаре.
Mowаб дәвләтәкә р'эх Исраеле бу. Пәй мърна
мере xwәйи щыhур'a, Р'ут' дъдә к'ыфше кö чъдаси
дъле we хасийа we Нахомийева гъредайи бу.
Р'ут' мъләте щыhуйа qәбул дъкә чаша мъләте xwә
у Хöдане wан qәбул дъкә чаша Хöдане xwә. Qэнци
у бәрбънерийа Р'ут'е жъ алийе Хöданда найе бир-
кърыне. Сәрхwәбун у хирәта we Бөвазе пъсмаме



K'itêba R'ût'

Pêşgotin

Serhatîya R'ût' 1100 sal berî bûyîna Îsa qewimîye, wî çaxî hê p'adşa serwêrtî Îsraêlê ne dikirin. Ev serhatîya e'dile berdil, bona xweyîe'sila çawa ç'e'vekanîya avêye ku ber'iya bêwada e'mir dida merivêd gunek'ar. ²Ev serhatî li ser qîzeke Mowabîye cahil hatîye nivîsarê. Mowab dewleteke r'ex Îsraêlê bû. Pey mirina mîrê xweyî cihûr'a, R'ût' dide k'ifşê ku ciqasî dilê wê xasîya wê Nahomîyêva girêdayî bû. R'ût' miletê cihûya qebûl dike çawa miletê xwe û Xudanê wan qebûl dike çawa Xudanê xwe. Qencî û berbihêriya R'ût'ê ji alîyê Xudanda nayê bîrkirinê. Serxwebûn û xîreta wê Bowazê pismamê

wева жи ә'ян дъбэ. Ль гора қануна Исраел Bowaz Р'ут'е дъстинэ у диса чэрха Нахомийе р'аст дъбэ.³ Хълазийа к'ьтеbe bona р'ык'йиате te ньвисаре. Эw дъдэ к'ыфше кё кёр'e Bowaz у Р'ут'е буйэ калке п'адшайе Исраелейи мэзън, awa готи Дашъд. Анэгори қануна пироз ль Қануна Дöща-ри 23:3-да изъна мошибийа т'ёнэбу кё т'эви мълэте Исраел буна, ле Р'ут' бу пешэкэ Иса Мэсиh (Мэтта 1:5). Эва к'ьтеba hinин дъкэ, wэки мэръв р'аст башарийа xwэ Хёдан бинэ у анэгори ә'мьре wi бъжи, Хёдан ль пырсед навмълэтийе наньhер'э.⁴ Анэгори ә'рф-ә'дэте щыhуя эва к'ьтеba ль к'ништада р'ожа Пеншийэ h'эсабда te xwэндьне.

1

Элимэлэх нэфэрэд хвэва дъчэ Mowabe

¹ һена сэршертийа h'акъмада wэлетда бу хэла-ийи. Жь Бэйтлэh'ма Щыhуда мэръвэк т'эви к'ölфэта xwэ у hэр дö кёр'ед xwэ чу ә'рде Mowabe хэ-рибиийеда ма. ² Наве wi мэръви Элимэлэх* бу, наве к'ölфэта wi Нахоми бу, наве hэр дö кёр'a, йэк Mah'лон бу, йэк жи К'илион. Эвана Эфрат'и бун, жь Бэйтлэh'ма Щыhуда чунэ ә'рде Mowabe у

* 1:2 Бь зьмане Ибрани: «Хвэде п'адше мън э».

wêva jî e'yan dibe. Li gora qanûna Îsraêl Bowaz R'ût'ê distîne û dîsa çerxa Nahomîyê r'ast dibe.³ Xilazî-ya k'itêbê bona r'ik'inyatê tê nivîsarê. Ew dide k'ifşê ku kur'ê Bowaz û R'ût'ê bûye kalkê p'adşayê Îsraêlê-yî mezin, awa gotî Dawid. Anegorî qanûna pîroz li Qanûna Ducarî 23:3-da îzina mowabîya t'unebû ku t'evî miletê Îsraêl bûna, lê R'ût' bû pêşeke Îsa Mesîh (Metta 1:5). Eva k'itêba hîn dike, wekî meriv r'ast bawarîya xwe Xudan bîne û anegorî e'mirê wî bijî, Xudan li pirsêd navmiletîyê nanihêr'e.⁴ Anegorî e'rf-e'detê cihûya eva k'itêba li k'inîştada r'oja Pêncîye h'esabda tê xwendinê.

1

Elîmelex neferêd xweva diçe Mowabê

¹ Hêna serwêrtîya h'akimada welêtda bû xelayî. Ji Beytleh'ma Cihûda merivek t'evî k'ulfeta xwe û her du kur'êd xwe çû e'rdê Mowabê xerîbîyêda ma. ² Navê wî merivî Elîmelex* bû, navê k'ulfeta wî Nahomî bû, navê her du kur'a, yek Mah'lîn bû, yek jî K'îlyon. Evana Efrat'î bûn, ji Beytleh'ma Cihûda çûne e'rdê Mowabê û

* 1:2 Bi zimanê Îbranî: «Xwedê p'adşê min e».

ль wър ман. ³ Мере Nahomийе Элимәләх мър, Nahomi hәр дö кöр'ава ман. ⁴ Van hәр дö кöр'a զизед Mowabийа стандын, наве йәке Orpa бу, наве йәке жи Р'ут'. Эвана ль wър wәкә дәhә сала ман. ⁵ Паше hәр дö кöр'e we Mah'лон, K'илион жи мърън у әве к'öлфәте hәр дö кöр' мерва онда кърън.

⁶ Пәй ве йәкер'a әва p'абу кö т'әви hәр дö букед xwә жь ә'rde Mowabe вәгәr'ә wәлате xwә, чымки әве ә'rde Mowabeda бънистъбу, кö Xödan сәри ль щымә'tа xwә хъстийә, р'ыссе wан гиһанди йә. ⁷ Эва жь wi щийе xwә, т'әви hәр дö букед xwә p'абу кö p'ек'әвә вәгәr'ә wәлате Щынуда. ⁸ һынге Nahomийе готә hәр дö букед xwә: «hәр'ын лашо, hәр кәс вәгәr'ә мала баве* xwә. Быра Xödan p'ә'ma xwә ль wә бъкә, һун һындава мън у меред xwәйә мърида чаша бунә, әw wәкә we йәке жи бинә пешийа wә. ⁹ Быра Xödan бәхте wә вәкә, hәр кәс жь wә мала мере xwәда сыт'ар бә». Пәй ве го-тьнер'a Nahomi чу p'уйе wан, һынге зукин к'этә wан әw гърийан ¹⁰у готын: «На, әме жи т'әви тә ль сәр мълате тәда вәгәr'ын». ¹¹ Ле Nahomийе готә wан: «На զизед мън, пашда вәгәr'ын, һуне т'әви мън бенә чь? Т'ö бәт'ыне мънда кöр' hәнә, кö әw бъбынә меред wә? ¹² Пашда вәгәr'ын hәр'ын զизед

* 1:8 Хәбәр бъ хәбәр: «Мала дийа xwә».

li wir man. ³ Mêrê Nahomîyê Elîmelex mir, Nahomî her du kur'ava man. ⁴ Van her du kur'a qîzêd Mowabîya standin, navê yekê Orpa bû, navê yekê jî R'ût'. Evana li wir weke dehe sala man. ⁵ Paşê her du kur'ê wê Mah'lon, Kîlyon jî mirin û evê k'ulfetê her du kur' mîrva unda kirin.

⁶ Pey vê yekêr'a eva r'abû ku t'evî her du bûkêd xwe ji e'rdê Mowabê vege'r'e welatê xwe, çimkî evê e'rdê Mowabêda bihîstibû, ku Xudan serî li cime'ta xwe xistîye, r'isqê wan gîhandî ye. ⁷ Eva ji wî cîyê xwe, t'evî her du bûkêd xwe r'abû ku r'êk'eve vege'r'e welatê Cihûda. ⁸ Hingê Nahomîyê gote her du bûkêd xwe: «Her'in lawo, her kes vege'r'e mala bavê* xwe. Bira Xudan r'e'ma xwe li we bike, hûn hindava min û mîrêd xweye mirîda çawa bûne, ew weke wê yekê jî bîne pêşîya we. ⁹ Bira Xudan bextê we veke, her kes ji we mala mîrê xweda sit'ar be». Pey vê gotinêr'a Nahomî çû r'ûyê wan, hingê zûkîn k'ete wan ew girîyan ¹⁰ û gotin: «Na, emê jî t'evî te li ser miletê teda vege'r'in». ¹¹ Lê Nahomîyê gote wan: «Na qîzêd min, paşda vege'r'in, hûnê t'evî min bêne çi? T'u bet'inê minda kur' hene, ku ew bibine mîrêd we? ¹² Paşda vege'r'in her'in qîzêd

* ^{1:8} Xeber bi xeber: «Mala dîya xwe».

Р'ут' 1

мън, чымки мън иди салед xwэ дэрбаз кърынэ, эз ха иди мер накъм. Йан hэгэр мън бъгота гёман hэйэ, кё эзе ишэв мер кым кёр'a биньм, ¹³ гэло hunе haqas wэхт бъмана, h'эта эш мэзын буна? Йан bona ве йэке hunе бъмана wэйе мер нэкърана? Нализед мън, дыле мън жь wэ зэ'фтьр ль сэр wэ дешэ, чымки дэсте Хёдан ль сэр мън гъран буйэ». ¹⁴ У wan диса кърэ зарин у гъриян. Орпа чу р'уйе xwэсийя xwэ вэгэр'ийя, ле Р'ут' жь we нэгэтийя.

¹⁵ Hынгэ Nahомийе хотэ Р'ут'е: «Ва йэ жынт'ийя тэ ль сэр щымэ'та xwэ у xwэдайед xwэда вэгэр'ийя, тё жи ль пэй жынт'ийя xwэ hэр'э». ¹⁶ Ле Р'ут'е хоте: «П'ейи ль сэр мън нэкэ, кё эз жь тэ бъдэгээд дур к'эвьм, чымки тё к'ёда hэр'и эзе бем, тё ль к'ё бъмини эзе жи ль wър бъминьм. Щымэ'та тэйе щымэ'та мън бэ, Xwэдэе тэйе Xwэдайе мън бэ. ¹⁷ Тё ль к'идэрэ бъмьри эзе жи ль wър бъмьрьм у ль wър бемэ дэфын кърыне. Чь hатийэ ль сэре мън, бъра Хёдан жь ве йэке хърабтър бинэ ль сэре мън, hэгэр пештыри мърыне, тыштэки майин мън жь тэ бъдэгэтийнэ». ¹⁸ Гава Nahомийе дина xwэ дайе, wэки эве нета xwэда данийэ кё э'сэ т'эви we hэр'э, иди зор ле нэкър.

¹⁹ Hынгэ hэр дёйа hэвр'a данэ ль сэр p'e h'эта Бэйтлэh'me чун. У гава к'этынэ Бэйтлэh'me, h'эж

min, çimkî min îdî salêd xwe derbaz kirine, ez xa îdî mîr nakim. Yan heger min bigota guman heye, ku ezê işev mîr kim kur'a bînim, ¹³ gelo hûnê haqas wext bimana, h'eta ew mezin bûna? Yan bona vê yekê hûnê bimana weyê mîr nekirana? Na qîzêd min, dilê min ji we ze'ftir li ser we dêşe, çimkî destê Xudan li ser min giran bûye». ¹⁴ Ü wan dîsa kire zarîn û girîyan. Orpa çû r'ûyê xwesîya xwe vege'rîya, lê R'ût' ji wê neqetîya.

¹⁵ Hingê Nahomîyê gote R'ût'ê: «Va ye jint'îya te li ser cime'ta xwe û xwedêyêd xweda vege'rîya, tu jî li pey jint'îya xwe her'e». ¹⁶ Lê R'ût'ê gotê: «P'êyî li ser min neke, ku ez ji te biqetim dûr k'evim, çimkî tu k'uda her'î ezê bêm, tu li k'u bimînî ezê jî li wir bimînim. Cime'ta teyê cime'ta min be, Xwedê teyê Xwedêyê min be. ¹⁷ Tu li kîderê bimirî ezê jî li wir bimirim û li wir bême defin kîrinê. Çi hatîye li serê min, bira Xudan ji vê yekê xirabtir bîne li serê min, heger pêştirî mirinê, tiştekî mayîn min ji te biqetîne». ¹⁸ Gava Nahomîyê dîna xwe dayê, wekî evê nîta xweda danîye ku e'se t'evî wê her'e, îdî zor lê nekir.

¹⁹ Hingê her duya hevr'a dane li ser r'ê h'eta Beytleh'mê çûn. Ü gava k'etine Beytleh'mê, h'ej

к'этэ т'эмамийа бажер у к'ёлфэта дыготьн: «Эва Нахоми йэ?»²⁰ Ле әве дыготэ wan: «Мынр'a нәбезжын Нахоми*, ле мынр'a бежын Мара**, чымки Йе hәри Зор дәрд у кёлава әз данимә.²¹ Эз т'ер-т'ъжи дәрк'этъм чум, ле Хёдан әз дәствала вәгәр'андым. Иди чьма бежынә мын Нахоми? hәгәр Хёдан чәрхамын ч'әп кыр у Йе hәри Зор әз кырымә ве р'оже?»²² Бы ви awайи Нахоми т'эви бука xwә Р'ут'a Mowabibi, жь ә'rde Mowabibie вәгәр'ийя у wәхте дәстпекърна щәһдьруне гъништынә Бәйтләh'me.

2

Р'ут' зэвийа Bowazда сымбыла t'оп дыкә

¹ Пысмамәки малмеране Нахомийе hәбу. Эва жь р'ык'йаты Элимәләх бу, йәки xwәйинhәбуk, бы нав у дәнг бу, наве wi Bowaz бу. ²Р'ут'a Mowabibi хотэ Нахомийе: «Эз hәр'ымә нава зэвийя, дыле к'е ль сәр мын бешә, әз пәй wi hәр'ым сымбыла т'оп кым». Эwe хотэ we: «hәр'ә qиза мын». ³У Р'ут' чу к'этэ зэвике, пәй нандьруйа сымбыл т'оп кырьн. У жер'a ёса льhәв hатыбу, кö әw к'этъбу зэвийя Bowaze жь р'ык'йаты Элимәләх. ⁴Awa Bowaz жь

* 1:20 Омъдайи, дылшәват.

** 1:20 Тә'lайи, дылеши.

k'ete t'emamîya bajêr û k'ulfeta digotin: «Eva Nahomî ye?»²⁰ Lê ewê digote wan: «Minr'a nebêjin Nahomî*, lê minr'a bêjin Mara**, çimkî Yê Herî Zor derd û kulava ez danîme.²¹ Ez t'êr-t'ijî derk'etim çûm, lê Xudan ez destvala vege'r'andim. Îdî çima bêjine min Nahomî? Heger Xudan çerxa min ç'ep kir û Yê Herî Zor ez kirime vê r'oje?»²² Bi vî awayî Nahomî t'evî bûka xwe R'ût'a Mowabî, ji e'rdê Mowabîyê vege'r'îya û wextê destpêkirina cehdirûnê gihîştine Beytleh'mê.

2

R'ût' zevîya Bowazda simbila t'op dike

¹ Pismamekî malmêranê Nahomîyê hebû. Eva ji r'ik'inyata Elîmelex bû, yekî xweyîhebûk, bi nav û deng bû, navê wî Bowaz bû. ² R'ût'a Mowabî gote Nahomîyê: «Ez her'ime nava zevîya, dilê k'ê li ser min bêşe, ez pey wî her'im simbila t'op kim». Ewê gote wê: «Her'e qîza min». ³ Û R'ût' çû k'ete zevîkê, pey nandirûya simbil t'op kirin. Û jêr'a usa lihev hatibû, ku ew k'etibû zevîya Bowazê ji r'ik'inyata Elîmelex. ⁴ Awa Bowaz ji

* 1:20 Omidayî, dilşewat.

** 1:20 Te'layî, dilêşî.

Бэйтлэх'ме хот готэ нандьруйа: «Хёдан qəwata wər'a бэ!» Wана ле вэгэр'анд у хот: «Быра Хёдан дёа ль тэ быкэ!»⁵ Һынге Bowaz жь хёламе кё чава сэрвэр ль сэр нандьруйа к'ыфш кърьбу пырси: «Эва qиза к'е йэ?»⁶ Хёламе сэрвере нандьруйа ле вэгэр'анд у хот: «Эва qизъка Mowabi йэ, йа кё т'эви Nahomийе жь ә'рде Mowабийе вэгэр'ийайэ hатийэ.⁷ Эве хотэ мэ: «Изьна wə həbə кё эз пэй нандьруйа сымбыла бъчынм у жь нава qəвшада жи т'оп кым». Ве събе зува эва hатийэ у h'эта ныha əw ль вър ə, qэт нэчуйэ мале р'yh'эт бэ жи».⁸ Һынге Bowaz хотэ Р'ут'е: «Быбыhe qиза мън, нэчи ә'рде хэлцеда т'оп нэки у жь вър жи дур нэк'эви, ле ль вър щэм щарийед мън бъмини.⁹ Дина xwə бъдэ we зэвийя кё əw дъдьрун у ль пэй wan hər'э. Мън bona тэ т'эми дайэ хёлама, кё qэдьре тэ нак'эвьн. Гава т'иби жи, незики дэрдана би у жь ава хёлама к'ышанди вэхши».¹⁰ Р'ут' дэвэр'уйя чу ә'рде у ль бэр та бу хоте: «Эва жь чийэ кё дыле тэ haqаси ль сэр мън дешэ у bona мън жи haqаси пырс-пырсийара дыки? Нэ эз йэкэ хэриб ьм?»¹¹ Һынге Bowaz ле вэгэр'анд у хоте: «Пэй мърьна мере xwər'a, тэ чь qэнщи xwəсийя xwər'a кърийэ, h'эму кърьнед тэ мънр'a гъли кърьнэ. Оса жи ә'йан э кё тэ чава де у баве xwə у wəлате xwə hьштийэ у hати гъништи we щымэ'те, к'ижан кё

Beytleh'mê hat gote nandirûya: «Xudan qewata we-r'a be!» Wana lê vege'r'and û got: «Bira Xudan dua li te bike!»⁵ Hingê Bowaz ji xulamê ku çawa serwêr li ser nandirûya k'ifş kiribû pirsî: «Eva qîza k'ê ye?»⁶ Xulamê serwêrê nandirûya lê vege'r'and û got: «Eva qîzika Mowabî ye, ya ku t'evî Nahomîyê ji e'r-dê Mowabîyê vege'r'iyaye hatîye.⁷ Evê gote me: Îzina we hebe ku ez pey nandirûya simbila biçinim û ji nava qewşada jî t'op kim». Vê sibê zûva eva hatîye û h'eta niha ew li vir e, qet neçûye malê r'ih'et be jî».⁸ Hingê Bowaz gote R'ût'ê: «Bibihê qîza min, neçî e'rdê xelqêda t'op nekî û ji vir jî dûr nek'evî, lê li vir cem carîyêd min bimînî.⁹ Dîna xwe bide wê zevîya ku ew didirûn û li pey wan her'e. Min bona te t'emî daye xulama, ku qedirê te nak'evin. Gava t'îbî jî, nêzîkî derdana bî û ji ava xulama k'i-şandî vexwî».¹⁰ R'ût' dever'ûya çû e'rdê û li ber ta bû gotê: «Eva ji çîye ku dilê te haqasî li ser min dêşê û bona min jî haqasî pirs-pirsîyara dikî? Ne ez yeke xerîb im?»¹¹ Hingê Bowaz lê vege'r'and û gotê: «Pey mirina mîrê xwer'a, te ci qencî xwesîya xwer'a kirîye, h'emû kirinêd te minr'a gilî kirine. Usa jî e'yan e ku te çawa dê û bavê xwe û welatê xwe hiştîye û hatî gihîştî wê cime'tê, k'ijan ku

тә пешда нас нәдькър. ¹² Быра wәкә кърына тә Хёдан бинә пешия тә у быра Хёдан Xwәдeйe Исраел ль сәр тәда бъбаринә, wәки тö hати бын p'эр'e wiда сыт'арәке бъбини». ¹³ Йынгe Р'ут'e готе: «Xwәйe мън, әз дъбинъм кö дъле тә ль сәр мън дъшәвътә, чымки тö бәр дъле мънда hати у тә т'әви щарийа xwә ширын-ширын хәбәр да, ле р'аст әз wәкә щарикә тә жи ниным». ¹⁴ Bowaz wәхте нанхварыне готә we: «К'эрәм кә сәр нен у пә'рийе xwә сыркеда кә». Р'ут' т'әви нандъруйа р'унышт. Эши фырикед qәланди данә we, әwe xwar т'ер бу у бәр жи ма. ¹⁵ Гав әwa р'абу чу сымбыла т'оп кә, Bowaz т'әми да хöламед xwә у гот: «Быра әw жь нав qәвшада жи т'оп кә у we нәдьнә шәриме. ¹⁶ Бона хатьре we жь qәвша жи бавежънә ә'rде у бънельн быра т'оп кә, бехатърия we нәкън».

¹⁷ Эwe h'ета бәре еваре we зәвийеда т'оп кър у гава әw к'öта, бу т'орпә щәh. ¹⁸ Р'ут'e т'орпе xwә hълда чу бажер у xwәсийа we әw щәhе wейи т'опкъри дит, йынгe Р'ут'e әw бәрмайие жь wi хöрәке кö пе т'ер бъбу жи дәрхъст да we. ¹⁹ Йынгe xwәсийе же пърси у готе: «Иро тә жь к'ö т'оп кърийә у ль к'ö хәбъти ии? Быра дöа ль wi бә, йе кö тәr'a кърийә qәнщи». Йынгe әwe xwәсийа xwәr'a гъли кър, кö щәм k'е хәбътийә у гот: «Наве wi мәръве кö әз иро щәм wi хәбътимә Bowaz ә».

te pêşda nas nedikir.¹² Bira weke kirina te Xudan bîne pêşîya te û bira Xudan Xwedêyê Îsraêl li ser te-da bibarîne, wekî tu hatî bin p'er'ê wîda sit'arekê bibînî». ¹³ Hingê R'ût'ê gotê: «Xweyê min, ez dibî-nim ku dilê te li ser min dişewite, çimkî tu ber dilê minda hatî û te t'evî carîya xwe şîrin-şîrin xeber da, lê r'ast ez weke carîke te jî nînim». ¹⁴ Bowaz wextê nanxwarinê gote wê: «K'erem ke ser nêñ û pe'rîyê xwe sirkêda ke». R'ût' t'evî nandırûya r'ûnişt. Ewî fi-rîkêd qelandî dane wê, ewê xwar t'êr bû û ber jî ma. ¹⁵ Gav ewa r'abû çû simbila t'op ke, Bowaz t'e-mî da xulamêd xwe û got: «Bira ew ji nav qewşada jî t'op ke û wê nedine şermê». ¹⁶ Bona xatirê wê ji qewşa jî bavêjine e'rdê û bihêlin bira t'op ke, bêxa-tirîya wê nekin».

¹⁷ Ewê h'eta berê êvarê wê zevîyêda t'op kir û ga-va ew k'uta, bû t'orpe ceh. ¹⁸ R'ût'ê t'orpê xwe hilda çû bajêr û xwesîya wê ew cehê wêyî t'opkirî dît, hingê R'ût'ê ew bermayîê ji wî xurekê ku pê t'êr bi-bû jî derxist da wê. ¹⁹ Hingê xwesîyê jê pirsî û gotê: «Îro te ji k'u t'op kirîye û li k'u xebitî yî? Bira dua li wî be, yê ku ter'a kirîye qencî». Hingê ewê xwesîya xwer'a gilî kir, ku cem k'ê xebitîye û got: «Navê wî merivê ku ez îro cem wî xebitîme Bowaz e».

²⁰ Нахомийе готэ бука хвэ: «Бъра дёайе Хёдан ль wi бэ, кё өши пышта хвэ нэда мьри у зендийа». Нахомийе готэ we: «Эw мэрьва йэки жь р'ык'ын-йата мэ йэ, пысмамэки мэйи незик э, гэрэке али мэ быкэ*». ²¹ Һынгэ Р'ут'а Mowabi гот: «Эши ёса жи готэ мьн: 〈Жь хёламед мьн дур нэк'эви, h'эта кё өw нандьруна мьн хълаз нэкън〉». ²² Нахомийе бука хвэ Р'ут'р'a гот: «Qэнщ э qиза мьн, кё тё т'эви щарийед wi hэр'и-бейи у тэ нава э'рде хэл-к'еда нэбиньн». ²³ Р'ут' жь щарийед Bowaz дур нэ-к'эт, h'эта хълазийа щэхдьрун у гэньмдьруне сым-был т'оп дъкърын у ль щэм хвэсийа хвэ жи дьма.

3

Р'ут' жь Bowaz дэ'wa пысмамтийе дъка

¹ Хвэсийа Р'ут'e, Нахомийе готэ we: «Qиза мьн, ээз дыхвазым кё тэ сыт'ар кым, кё ахърийа тэ хер бэ.

² Ва йэ Bowaze жь р'ык'ын-йата мэ, щэм щарийед к'ижани тё дъмайи, эwe ишэв бедэрэда щеh бьдэ бе.

³ Р'абэ ньha сэре хвэ бышо, р'уне бинхвэш ль хвэ дэ, хэмьла хвэ ль хвэ кэ у бэржери бедэрэ бэ, ле тё хвэ нишани wi нэди, h'эта өw хварын-вэхварына

* ^{2:20} Qануна Дёщари 25:5-10; Qануна К'аһинтийе 25:47-49; Ибо 19:25; Ишайя 49:26.

²⁰ Nahomîyê gote bûka xwe: «Bira duayê Xudan li wî be, ku ewî pişta xwe neda mirî û zêndîya». Nahomîyê gote wê: «Ew meriva yekî ji r'ik'inyata me ye, pismamekî meyî nêzîk e, gerekê alî me bike*».

²¹ Hingê R'ût'a Mowabî got: «Ewî usa jî gote min: «Ji xulamêd min dûr nek'evî, h'eta ku ew nandirûna min xilaz nekin». ²² Nahomîyê bûka xwe R'ût'r'a got: «Qenc e qîza min, ku tu t'evî carîyêd wî herî-bêyî û te nava e'rdê xelqêda nebînin». ²³ R'ût' ji carîyêd Bowaz dûr nek'et, h'eta xilazîya cehdirûn û genimdirûnê simbil t'op dikirin û li cem xwesîya xwe jî dima.

3

R'ût' ji Bowaz de'wa pismamtiyê dike

¹ Xwesîya R'ût'ê, Nahomîyê gote wê: «Qîza min, ez dixwazim ku te sit'ar kim, ku axirîya te xêr be.

² Va ye Bowazê ji r'ik'inyata me, cem carîyêd k'îjanî tu dimayî, ewê îşev bêderêda cêh bide bê.

³ R'abe niha serê xwe bişo, r'ûnê bînxweş li xwe de, xemila xwe li xwe ke û berjêrî bêderê be, lê tu xwe nîşanî wî nedî, h'eta ew xwarin-vexwarina

* ^{2:20} Qanûna Ducarî 25:5-10; Qanûna K'ahîntîyê 25:47-49; Îbo 19:25; İsaya 49:26.

xwэ хълаз нэкэ. ⁴У гава әw дькэ кё р'азе, тё гос-
qöлахийа щийе р'азана wi быкэ у hэр'э бынп'ийе-
ва бык'евэ щийе wi п'алдэ. һынгэ әwe тэр'a бежэ,
кё тё чь гэрэке быки». ⁵Р'ут'e хотэ we: «Тэ чь т'эми
данэ мън, эзе h'emu тышти жи ёса быкъм».

⁶Эw бэржери бедэре бу у xwэсийе чawa т'эми
дабуйе, әwe ёса жи кър. ⁷Бowaz пэй xварын-вэ-
xварынер'a, к'ефа wi щи, чу бэр щэhe лод къри
п'алдэ кё р'азе. һынгэ әwa тэлэ-тэл чу, бынп'ийе-
ва к'этэ нава щийе wi п'алда. ⁸Ниве шэве әw мэ-
рьв вэщьньци, вэгэр'ийа дина xwэ дайе, ва йэ
к'ölфэтэк бынп'ийеда п'алдайи йэ. ⁹Эши же пър-
си: «Tö к'е йи?» Эwe хоте: «Эз щарийа тэ Р'ут' ьм,
п'еша xwэ бавежэ ль сэр щарийа xwэ, чымки тё
пъсмаме мъни незик и». ¹⁰Эши хоте: «Дёайе Xö-
дан ль тэ бэ qиза мън! Р'астийа тэйэ ве ахърийе
жь йа pешьн qэнштър ә, чымки тё пэй щаыльед
к'эсиб йан дэвлэти нэчүйи. ¹¹Нына qиза мън нэ-
тьрсэ, тэ чь мънр'a хот эзе быкъм, чымки т'эмами-
йа щымэ'та бажер занэ, кё тё к'ölфэтэкэ xwэйи-
э'сыл и. ¹²Р'аст ә кё эз пъсмаме тэ мэ, ле нава
пъсмамтийа мэда йэки he незик hэйэ. ¹³Ишэв ль
вър шэва xwэ дэрбаз кэ. Събэhe зу hэгэр әw алийе
борщдарийа пъсмамтийеда тэ qабул кэ, әw тыштэ-
ки qэнщ ә, быра qабул кэ, ле hэгэр әw борщдарийа
пъсмамтийе нэхwазэ бъqдинэ тэ qабул кэ, һынгэ

xwe xilaz neke. ⁴Û gava ew dike ku r'azê, tu gosqu-laxîya cîyê r'azana wî bike û her'e binp'iyêva bik'e-ve cîyê wî p'alde. Hingê ewê ter'a bêje, ku tu çi ge-rekê bikî». ⁵R'ût'ê gote wê: «Te çi t'emî dane min, ezê h'emû tiştî jî usa bikim».

⁶Ew berjêrî bêderê bû û xwesîyê çawa t'emî da-bûyê, ewê usa jî kir. ⁷Bowaz pey xwarin-vexwarinê-r'a, k'êfa wî cî, çû ber cehê lod kirî p'alde ku r'azê. Hingê ewa tele-tel çû, binp'iyêva k'ete nava cîyê wî p'alda. ⁸Nîvê şevê ew meriv veciniqî, vegeŕîya dîna xwe dayê, va ye k'ulfetek binp'iyêda p'aldayî ye. ⁹Ewî jê pirsî: «Tu k'ê yî?» Ewê gotê: «Ez carîya te R'ût' im, p'êşa xwe bavêje li ser carîya xwe, çimkî tu pismamê minî nêzîk î». ¹⁰Ewî gotê: «Duayê Xudan li te be qîza min! R'astîya teye vê axirîyê ji ya pêşin qenctir e, çimkî tu pey cahilêd k'esîb yan dewletî neçûyî. ¹¹Niha qîza min netirse, te çi minr'a got ezê bikim, çimkî t'emamîya cime'ta bajêr zane, ku tu k'ulfeteke xweyî'e sil î. ¹²R'ast e ku ez pismamê te me, lê nava pismamîya meda yekî hê nêzîk heye. ¹³Îşev li vir şeva xwe derbaz ke. Sibehê zû heger ew alîyê borcdarîya pismamîyêda te qebûl ke, ew tiş-tekî qenc e, bira qebûl ke, lê heger ew borcdarîya pismamîyê nexwaze biqedîne te qebûl ke, hingê

эзэ бъодиньм у тэ qэбул към. Хвэдэ hэйэ! П'алдэ ль вър h'эта събе».

¹⁴ Эве h'эта к'эwe събэйе бънп'ийа шида п'алда у ёса зу р'абу, кё he т'ё кэси нъкарьбу кэсэк нас къра. У hынге өши готе: «Бъра т'ё кэс нъзаньбэ, кё к'ölфэт к'этийэ бедэрэ». ¹⁵ Паше готэ we: «Шала ль сэр xwэ бинэ вър бъгърэ». Эwe өw гърт у Bowaz шэш код щэh чап кър, да ль сэр мъла у өw чу бажер. ¹⁶ Эwa жи чу щэм хвэсийа xwэ у we же пърси: «Qиза мън, тё чawa йи?» Эwe хвэсиер'a гъли кър, чь кё wi мэрьви bona we кърьбу. ¹⁷ Паше жи хвэсийер'a гот: «Эв шэш код щэh өши да мън, гот: <Дэствала ль сэр хвэсийа хвэда вэнэгэр'э».

¹⁸ Hынге Nahомийе готе: «Qиза мън нъha сэбър кэ, h'эта кё бъзаньби эв шхёле we чawa бе сери, чымки өw мэрьва h'эта иро өви шхёли сафи нэкэ, дыле wi r'yh'эт набэ».

4

Bowaz Р'ут'e дъстинэ

¹ Bowaz чу ль бэр дэргэhe* бажер р'унышт. У awa өw пъсмаме кё Bowaz бэ'са wi кърьбу дэрбаз

* ^{4:1} Wi чахи мэйдана незики дэргэhe бажер өw щийе bona т'ощарэтийе, дишане у цырара бу.

ezê biqedînim û te qebûl kim. Xwedê heye! P'alde li vir h'eta sibê».

¹⁴ Evê h'eta k'ewê sibeyê binpîya wîda p'alda û usa zû r'abû, ku hê t'u kesî nikaribû kesek nas kira. Ü hingê ewî gotê: «Bira t'u kes nizanibe, ku k'ulfet k'etîye bêderê». ¹⁵ Paşê gote wê: «Şala li ser xwe bîne vir bigire». Ewê ew girt û Bowaz şes kod ceh çap kir, da li ser mila û ew çû bajêr. ¹⁶ Ewa jî çû cem xwesîya xwe û wê jê pirsî: «Qîza min, tu çawa yî?» Ewê xwesîer'a gilî kir, ci ku wî merivî bona wê kiribû. ¹⁷ Paşê jî xwesîyêr'a got: «Ev şes kod ceh ewî da min, got: Destvala li ser xwesîya xweda venege-r'e». ¹⁸ Hingê Nahomîyê gotê: «Qîza min niha sebir ke, h'eta ku bizanibî ev şixulê wê çawa bê sêrî, cim-kî ew meriva h'eta iro evî şixulî safî neke, dilê wî r'iħ'et nabe».

4

Bowaz R'ût'ê distîne

¹ Bowaz çû li ber dergehê* bajêr r'ûnişt. Ü awa ew pismamê ku Bowaz be'sa wî kiribû derbaz

* 4:1 Wî çaxî meydana nêzîkî dergehê bajêr ew cîyê bona t'ucaretiyê, dîwanê û qirara bû.

дъбу. Bowaz наве wi һылда гази кыре у готе: «К'эрәм кә хеләке ль вър р'уни». Эw жи вәгәр'ийа р'унышт. ² Паше Bowaz гази дәһә р'усыпийед бажер кыр у готә wan: «К'эрәм кын ль вър р'унен». Эw жи р'уныштын. ³ Һынге Bowaz готә wi пысмами: «Нahомийа кё жь э'rde Mowabe вәгәр'ийайә hatийә, дыхвазә wi э'rde p'ара быре мә Әлимәләх бъфьрошә. ⁴ Эз фыкърим кё ве йәке бъгъиньмә röhe тә у тәr'a жи бежым, wәки tö пеш назыред р'унышти у р'усыпийед щымә'ta мынва ве p'аре бък'yr'i. һәгәр tö дыхвази бъ изына пысмамтийе ве p'аре бък'yr'i, бък'yr'e. Ле һәгәр нахвази, мынр'a бәжә кё эз заньбым, чымки пештьри тә иди t'ö кәс t'önә кё борще пысмамтийе бъqәдинә. Пәй тәr'a ль мын дъk'әвә». Эви гот: «Бәле әзе борще пысмамтийе бъqәдиньм» ⁵ Һынге Bowaz ль сәр ве йәкеда зедәкър у готә wi пысмами: «Ве жи заньбә, гава we р'oжа tö жь Нahомийе wi э'rди бък'yr'i, гәрәке жына йе мъри, Р'ут'a Mowabi жи бъстини, wәки wape йе мъри шин ки, кё наве wi онда нәбә*. ⁶ Һынге wi пысмами гот: «Эз ви борще пысмамтийе ныкарым бъqәдиньм, нәбә кё эз wape xwә р'еш кым. Ви борще пысмамтия мын tö бъqәдинә, чымки жь qәwата мын дәр ә». ⁷ (Бәре нава

* 4:5 Qануна Дöщари 25:5-10.

dibû. Bowaz navê wî hilda gazî kirê û gotê: «K'erem ke xêlekê li vir r'ûnî». Ew jî veger'îya r'ûnişt.
² Paşê Bowaz gazî dehe r'ûsipîyêd bajêr kir û go-te wan: «K'erem kin li vir r'ûnên». Ew jî r'ûniştin.
³ Hingê Bowaz gote wî pismamî: «Nahomîya ku ji e'rdê Mowabê veger'iyaye hatîye, dixwaze wî e'rdê p'ara birê me Elîmelex bifiroşe. ⁴Ez fikirîm ku vê yekê bigihînime guhê te û ter'a jî bêjim, wekî tu pêş hazirêd r'ûniştî û r'ûsipîyêd cime'ta minva vê p'arê bik'ir'î. Heger tu dixwazî bi îzina pismamtîyê vê p'arê bik'ir'î, bik'ir'e. Lê heger naxwazî, minr'a beje ku ez zanibim, çimkî pêstirî te idî t'u kes t'une ku borcê pismamtîyê biqedîne. Pey ter'a li min dik'eve». Ewî got: «Belê ezê borcê pismamtîyê biqedînim» ⁵Hingê Bowaz li ser vê yekêda zêdekir û gote wî pismamî: «Vê jî zanibe, gava wê r'ojâ tu ji Nahomîyê wî e'rdî bik'ir'î, gerekê jina yê mirî, R'ût'a Mowabî jî bistînî, wekî warê yê mirî şîn kî, ku navê wî unda nebe*». ⁶Hingê wî pismamî got: «Ez vî borcê pismamtîyê nikarim biqedînim, nebe ku ez warê xwe r'es kim. Vî borcê pismamtîya min tu biqedîne, çimkî ji qewata min der e». ⁷(Berê nava

* 4:5 Qanûna Ducarî 25:5-10.

Исраелда әв йәк hәбу, к'yr'ин йан фьротанәкеда кö hәр тышт бь шә'dәти у избати бъбуяа, hынге меръв сола ныге xwә дехъст у дъда hәвале xwә. У әв йәк Исраелда дъбу шә'dәти.)⁸ Паше wi пысамми хотә Bowaz: «Tö xwәr'a бъk'yr'ә». У сола ныге xwә ехъст да wi.⁹ Wi чахи Bowaz хотә wan р'усьпийа у т'эмамияа щымә'te: «hун иро шә'dә нә, кö мын h'әму hәбука Элимәләх, К'илион у Mah'лон жъ Nahomийе k'yr'i.¹⁰ У жына Mah'лон, R'ut'a Mowаби жи мын xwәr'a жын станд, wәки наве йе мьри жъ нава бъратийа wi у щи-warед wi онда набә. Бона р'ожа иройин hун шә'dә нә».¹¹ Hынге h'әму щымә'ta бәр дәргәh, р'усьпийава т'әвайи хотын: «Эм шә'dә нә. Быра Xöдан we к'ölфәта кö we бъk'әвә мала тә, бъkә мина R'ahеле у Леайе, к'ижана кö мала Исраел ава кърын. Tö нава Эфрат'e да qәват bi у Бәйтләh'meda жи навәки qазынщ ки.¹² Быра мала тә бъbә мина мала Перес, чаша кö T'амаре жъ we мале зör'эт ль пәй Щынуда хъст, öса жи Xöдане жъ ве к'ölфәта щаňыл бъдә тә».

¹³ Bowaz R'ut' станд, әw бунә h'әлале hәв. Бъ р'ә'mа Xwәде әw h'әмлә дәрк'эт у кör'әк ани.

¹⁴ Hынге к'ölфәта хотә Nahomийе: «Шыкър жъ Xöдан, кö әши иро тö бе зör'эт бе пысамаме незик нәhышти, wәки наве ве р'ыk'нийате Исраелда нә-йе биркърыне!¹⁵ Быра әва т'ыфала бъbә бина ль

Îsraêlda ev yek hebû, k'ir'în yan firotanekêda ku her tişt bi şe'detî û îzbatî bibûya, hingê mîriv sola nigê xwe dêxist û dida hevalê xwe. Û ev yek Îsraêlda dibû şe'detî.)⁸ Paşê wî pismamî gote Bowaz: «Tu xwer'a bik'ir'e». Û sola nigê xwe êxist da wî.⁹ Wî çaxî Bowaz gote wan r'ûsipîya û t'emamîya cime'tê: «Hûn îro şe'de ne, ku min h'êmû hebûka Elîmelex, Kîlyon û Mah'lon ji Nahomîyê k'ir'î.¹⁰ Û jina Mah'lon, R'ût'a Mowabî jî min xwer'a jin stand, wekî navê yê mirî ji nava biratîya wî û cî-warêd wî un-da nabe. Bona r'oja îroyîn hûn şe'de ne».¹¹ Hingê h'êmû cime'ta ber dergeh, r'ûsipîyava t'evayî go-tin: «Em şe'de ne. Bira Xudan wê k'ulfeta ku wê bi-k'eve mala te, bike mîna R'ahêlê û Léayê, k'ijana ku mala Îsraël ava kirin. Tu nava Efrat'êda qewat bî û Beytleh'mêda jî navekî qazinc kî.¹² Bira mala te bi-be mîna mala Pêrêş, çawa ku T'amarê ji wê malê zur'et li pey Cihûda xist, usa jî Xudanê ji vê k'ulfeta cahil bide te».

¹³ Bowaz R'ût' stand, ew bûne h'elalê hev. Bi r'e'ma Xwedê ew h'emle derk'et û kur'ek anî.

¹⁴ Hingê k'ulfeta gote Nahomîyê: «Şikir ji Xudan, ku ewî îro tu bê zur'et bê pismamê nêzîk nehiştî, wekî navê vê r'ik'inyatê Îsraêlda neyê bîrkirinê!¹⁵ Bira eva t'ifala bibe bîna li

бэр тэ у шьва дэсте тэ, э’мьре мэзьнайийеда, чьмки эва жь we бука кё тэ h’ъз дыкэ дыне к’этийэ, иа кё тэр’а жь h’эфт кёр’а четыр э». ¹⁶ Пэй ве готьнер’а Нахомийе кёр’ык һылда да h’эмеза хwэ у жер’а бу бэрдэргуш. ¹⁷ К’олфэтед щинара нав ле кърын у готьн: «Нахомийер’а кёр’эк бу» У наве ви Овед данин. Эва баве Йешайе баве Да-шьд бу.

¹⁸ У зёр’этед Перес өв ын: Жь Перес һэсрун бу, ¹⁹ жь һэсрун Р’ам бу, жь Р’ам Аминадав бу, ²⁰ жь Аминадав Нэһшон бу, жь Нэһшон Салмон бу, ²¹ жь Салмон Bowaz бу, жь Bowaz Овед бу, ²² жь Овед Йеша бу, жь Йеша жи Да-шьд бу.

ber te û şiva destê te, e'mirê mezinayîyêda, çimkî eva ji wê bûka ku te h'iz dike dinê k'etîye, ya ku ter'a ji h'eft kur'a çêtir e». ¹⁶ Pey vê gotinêr'a Nahomîyê kur'ik hilda da h'emêza xwe û jêr'a bû berdergûş. ¹⁷ K'ulfetêd cînara nav lê kirin û gotin: «Nahomîyêr'a kur'ek bû» Û navê wî Ovêd danîn. Eva bavê Yêşayê bavê Dawid bû.

¹⁸ Û zur'etêd Pêrêş ev in: Ji Pêrêş Hesrûn bû, ¹⁹ji Hesrûn R'am bû, ji R'am Amînadav bû, ²⁰ji Amînadav Nehşon bû, ji Nehşon Salmon bû, ²¹ji Salmon Bowaz bû, ji Bowaz Ovêd bû, ²²ji Ovêd Yêşa bû, ji Yêşa jî Dawid bû.